



## HEVPEYVÎN BI ZAHMETKÊŞ Û ÇALEKGEREKÎ KU DI MEDIYA KURDÎ DE NEHATIYE NASKIRIN RE

*Birayê Selim Temin, ez dizanim ku te bi salan di nav civaka Êzdiyan de wek zahmetkêş û berketiyê Kurdîtiyê xizmeteke hêja kiriye.*

**Ji bo xwandevaran jî te nasbikn, tû karî jî me re bêjî, ka zarokatiya te çewabû û tû jî malbateke çawa derketî?**

**Selîmê Mecîd-** Li goriya ku min jî dê û bavê xwe bihîstîye, ez di sala 1952 de li gundê Şimzê, yê ku di herêma bajarê Qubînê û parezgeha Batmanê de ye ji diya xwe Reşê û bavê xwe Mecîd re çêbûme.

Li goriya ku min jî mezinên malbata xwe bihîstîye, bavê min kurê kalikê min Mamedê Temo yê bi tenê bû û ez jî lawê bavê xwe yê yekemîn bûm. Lewma jî bi çêbûna min re zahf kêfa malbat, bav û kalikê min hatiye. Gelek nas û pismamên me dizanin û hêjî dibêjin, kalikê min Mamedê Temo û bavê min Mecîdê Mamed pir maldar û nandar bûn. Lewma jî hezkirina min di nav malbatê, nas û gundiyan de zêde hebû.

**Mînak:**

Tê bîramin gava ez şeş-heft salî bûm û di rojên sersal, cejn û cimayan de bi zarokên hevalên xwe re li nav malan alîkariyeke xwarin(gûz, nok, mewij û hwd.)ê digeriyam, hingê min didît ku gundî û nas para min jî ya hevalên min zêdetir didane min.

Vêca, ez di maleke weha nandar de mezin bûm. Ez jî nikarim peznê xwe bidim. Lê, ez dîsa weke ku pêşiya gotiye, "giya li ser koka xwe şîn tê" difikirim û dibêjim, ez jî li ber destên wan nandaran perwerde bûme û însalah ezê jî hêjayê emeka bav-kalên xwe bim.

Nayê bîramin ku min di zarokatiya xwe de û heta vêga tu neheqiyek li hevalên xwe kiriye. Heta jî min hatiye min xwe û hevalên xwe timî weke hevûdinê azad dîtiye. Heta jî min hatiye, min tûcarî xwe jî hevalan dewlementir û mezintir ne dîtiye.

Çaxê ez di sala 1961 de li Şimzê diçûme dibistana sereke, min dît ku ez ne li goriya çande û zimanê dê û bavê xwe tême perwerde kirin, ez gelekî acis dibûm. Lê, dîsa jî ez mecbûr bûm li goriya perwerda me ya di nav malê de li kesên ku diaxivin guhdarî bikim û wan tahamûl bikim. Di ser vê de re jî, ez di xwandin û nivîsandina xwe de gelekî jîr bûm. Mamosten min zahf jî jîrbûna min razî bûn. Dûre min zahf dixwast xwandina xwe berdewam bikim. Lê, herçiqas ez hingê jîrek û rewşa me ya aborî başbû jî, bavê min jî ber ku ez bitayê tenê bûm, zor û zilma li ser ol û çanda me Êzdiyan dibu didît, ne hişt ez herime dibistanên dinê bixwînim.

### **Selîmê bira, tû kengî û bi kêre zewiciyê?**

**Selîmê Mecîd -** Ez di sala 1966 de û di hivdeh saliya xwe de bi Meqbula qîza Sehîd û Silto re zewicîm. Rast bêjim, hingê min baş gelekî nizanîbûm zewac çiyê? Ji xwe di wextê zewaca me de, dê û bavên li goriya dilê xwe zarokên xwe dizewicandin. Qîz û kuran nikarîbûn bîryara dê û bavên xwe xera bikin. Li aliyê dinê, sedemekî vê zû zewaca min jê jî li goriya xwasteka malbatê buye. Daxwaza wan zarok û bi taybetî jî kurêkên min zû çêbivin û ew jî min re bivine piştekan. Malbat bi zarokên me gur û geş bive.

### **Birayê hêja, tû dikarî jî me re bahsa hinek zahmetî û astengiyên ku di nav civaka Êzdiyên li bakurê Kurdistanê diman bikî û te di nav wan zahmetiyên wê demê de çewa xwe û dinya naskir?**

**Selîmê Mecîd -** Ji bo min zahmetiya herî mezin ewbû ku, wextê ez li gund bûm, hingê zane û xwandevaran di nav gund û derora gundê me Şimzê de zahf kêma bûn. Her çiqas hingê zanabûna min jî tûnebû, lê min her dixwast li goriya rihê xwe tiştên baş ji bo xwe û dora xwe bikim. Gava hinek kasetên hozan Şivan Perwer di salên 1972 de derketin, ew stran û avazên wî gelekî bala min kişand ser xwe. Dîsa di van salan de çend kesên xwandevaran û hinek jî mamostên ku li gundê me diman, ewan gelek semîner û aqêdarî li ser zilm û zora jendirma, axa, beg û hemû paşveruyan li weltê me de hebûn didane me, ciwanên gund û ez jî beşdarî çalakîyên wan dibûm. Dûre gava min hinekî ji civak, ol û çanda Kurdî fahmkir û pêve, êdî bi xêra mamostê ku hingê li gundê me mamostetî dikirin hinek dahin û standinên min li Batmanê bi çend şoreşgerên ku bi navên komelên çep(Mînak: Komelgeha Mamosteyên Batmanê(TÖP-DER), kar dikirin re çêbû. Ez gelek caran jî gund diçûme nav xebata wan û min jî li goriya îmkanên xwe hingê alîkarî dida xebata wan. Ji xwe ew xizmeta ku wan şoreşgeran

Hevpeyvîn bi zahmetkêş û çalekgerekî nehatiye naskirin re

dikir, hingê fikrekî gelekî nû û pir nêzîkî ruhê min bû. Lê vêvga difikrim, hingê hinek çalakî bi nezanî li dijî çande û ola civaka me ya kevnar dihate meşandin.

Mînak:

Rahmetiyê bavê min Mecîdê Mamed di nav civaka me de dengbêjekî naskirî bû. Gava ewî di oda me anjî di maleke gundiyan de distira, ez li dijî wî derdiketim û min di digotê, divê tû van stranên paşketî nebêjî.

Weke min gotî, ev nêrîna me ya hingê şaş bû . Me bi vî karê qedexekirinê piştgirî dida wê bandora asîmlasyon û tûnekirina li ser çanede û zimanê Kurdî. Min hingê nizanîbû ku ev stranên Kurdî xizna vekolînên zanistî, dîrok û olperestiya me ne. Ji xwe gava meriv dîroka xwe ya kevn û nû nede berhevûdinê, meriv nikare wan baş nasbike û pêş jî bikeve. Dengbêjen Kurdî çande û dîroka nû bi ya kevn ve girê didan û hêji girêdidin.

*Birayê Selîm, li goriya ku min ji te fahmkir, tû dibêjî rahmetiyê bavê te Mecîdê Mamed jî di nav civaka Êzdiyan de dengbêjekî navdar bû. Tû dikarî hinekî bahsa hunermendiya bavê xwe bikî û hestên te ji bo wî çine?*

**Binêren li wêne:1**

**Selîmê Mecîd-** Bavê min mîna gelek dengbêjen herêmi anjî gelêrî di koçk û sarayên camêran xerîb de ne disitra. Eger jî evbû, di wî wextê ku bavê min dengbêjî dikir de, hingê kesên ku rewşa aboriya wan baş û dengê wan gelekî xweş bû, li xwe danetanîn herin di nav her civak, koçk û qesrên beg û maldaran de dengbêjiyê bikin. Ji ber van egeran, bavê min zêde li malên heval, nas û pismamên xwe re tenê disitra. Ji xwe gelek kesên ku li derûdora me jiyane dizanin, naveroka stran û kilamên bavê min jî ne mîna yên her dengbêjan bûn. Piraniya stranên wî li ser zaniyariya camêrî, pehlewani, parastina çand û olê bûn. Min tûcarî ne dîtiye ku bavêmin kilam anjî dîlok di dawet û kêfên gundiyan de gotine. Lê wexta oldar û nandarên li gundê me civînên taybetî û hinek cejin pîroz dikirin, hingê dixwastn ku bavê min here ji wan re bisitirê.

*Birê Selîm, gava meriv gelekcaran guhdariya stran û kilamên dengbêjekî dike, hingê dizane kîjan stran anjî klama wî ye kubar tesîrê li hestê meriv dike. Gelo! Ji nav stranên Xwedê jê raziyê bavê te, ku tû herî zêde hez jê dikir û tû dixwazî îro lê guhdarî bikî kîjane?*

**Selîmê Mecîd-** Mixabin û weke ku min di despêkê deji gotiye, min stran û kilamên rahmetiyê bavê xwe zêde guhdarî ne dikirin. Lê, wexta bavê min kilama “Mûsa Meleka” digot, hingê kêfa min gelekî ji vê sitrana wî re dihat. Lewma ez vêga hêji dikarim temamiya vê kilama wî, weha bi rêz bikim:

MÛSO MELEK

**Ax heyran hayê,  
Hayê, qurban hayê,  
ez benî Muso lawo!  
ne min digo tû neçe dîwana Mihemed begê Botî,  
Ev zalimî neyar e, tû ji wê ve nayê !**

Dilê minê ji dilanî diye  
Muso Melek lezkiriye û lezandiye  
Bi aliyê malê ve diçuyî ye  
Şal û şapikê bozbeğî li bejin û bala xwe kiriye  
Xencera qoce Misrî bi ser şal û şapikê bozbeğî ve berdayiye  
Bi axatî û paşatî qista dîwan, cindî û miferzê Mihemed begê Botî dikiriye  
Silav li dîwana Mihemed begê Botî, li cindî û miferziyan dikiriye  
Kesekî ji wan silava Mûso Melek venegerandiye  
Mûso Melek wî qasî mirina xwe li ber çavê xwe aniye  
Tevî sol û gora çuye li newqa Mihemed begê Botî li dîwanê rûniştiye.

**Ax heyran hayê,  
Hayê qurban hayê,  
ez benî Muso lawo!  
ne min digo tû neçe dîwana Mihemed begê Botî,  
Ev zalimî neyar e, tû ji wê ve nayê !**

Dilê minê ji dilanî diye  
Gava Mihemed Begê çav bi Mûso ketiye  
Rihê Mûso di pêş çavê wî de weke rihê mirinê diavitiye,  
Dibê, Mûso lawo tû gelekî bi xêr û silamet hatiye  
Wele minê sahkiriye te xencereke nû kiriye,  
Kaca xencera xwe bide destên Axa yê xwe, çi terzî ye?

**Ax heyran hayê,**

**Hayê qurban hayê,  
ez benî Muso lawo!  
ne min dîgo tû neçe dîwana Mihemed begê Botî,  
Ev zalimî neyar e, tû ji wê ve nayê !**

Dilê minê ji dilanî diye  
Gava Mihemed begê Botî ji Mûso re wer gotiye,  
Mûso Meleka dibê, axa dilê minî dilanî diye ,  
Bi sere bavê te kim, raste min xencerek nû kiriye,  
Minê di heqîda qaşekî xirab de pêçdaye, rastî çavnas û pêzana ra kiriye  
Ewan gotiya xencera Mûsa Meleka, ye qoce Misrî ye.

**Ax heyran hayê,  
Ez gorî hayê ,  
ez benî hayê,  
ne min dîgo tû neçe dîwana Mihemed begê Botî,  
ew zalimî ji cinsê te re neyare , tû ji wê ve nayê !**

Dilê minê ji dilanî diye  
Li newqa Mûso Meleka heye Şaqûlê Berwari ye,  
Ew dibê Mûsa keko, dilê minî dilanî diye,  
bîra xwe bine, ez û te yê heft salan bihevûdin re geriyabûn bi biratiye  
qe tû amil nabî xencera xwe bidî vî destiye?

Gava vî wusa ji Mûso Meleka re wer gotiye,

Mûso Meleka xencer ji kala kişandiye  
Daye ser destê Şaqûlê Berwari ye

Şaqûlê Berwarî xencerê yek û yeko, dido û dido  
li dîwana cindî û miferzê Mîrê Bota teva gerandiye,  
gotine Xwedê zanî xencera Mûso Meleka cawhir e û hir qoce Misrî ye  
Xencer ketiye ber destên Mihemed begê Botî ye  
Înkara xwe ji Mûso re ne gotiye,  
Dibê Mûso lawo !  
Raste xencera te hir qoce Misrî ye.

**Ax heyran hayê,  
Ez gorî hayê ,  
ez benî hayê,  
ne min dîgo tû neçe dîwana Mihemed begê Botî,  
ew zalimî ji cinsê te re neyar e , tû ji wê ve nayê !**

Dilê minê ji dilanî diye !  
Xencer ketiye destê Şaqûlê Berwari ye  
Mihemed begê mîrê Botî dibê Mûso min li te teka, wa teka  
Te çima wê rojê xwîlamên min dabûne ber tifeka?

Dibê axa ez Mûsa yê Xelef im !  
Ezê xwediyî û xudanê xencera sed teref im!  
Civata ez lê rûnêm, Axa ez bigotinên gur û bigef im!

**Ax heyran hayê,  
Hayê qurban hayê,  
ez benî Muso lawo!  
ne min dîgo tû neçe dîwana Mihemed begê Botî,  
Ev zalimî neyar e, tû ji wê ve nayê !**

Dilê minê ji dilanî diye !  
Gava Mûso Melek wer gotiye

Mihemed begê Botî dibê Mûso lawo !  
Dilê minê ji dilanî diye !  
Wele îro ezê serê te divê diwanê de ser jêkim bi vî destî ye !

Dilê minê ji dilanî diye !  
Mûso dibê axa ez Mûso me, Mûsayê bav Xelef im  
Xweyî û xudanê xencera sed teref im !  
Axa ! ez bi sere bavê te kim !  
Çi civata ez lê rûnêm, ez bi gotin û galgala xwe bi gur û gef im

Axa sayiyê pele ewr e,  
bi sere bavê te kim, gava tû serê Mûso Meleka jêkî,  
wê hingê jinên van mêrên oba ku niha li cimaata we hazirin tevê bimînine stewr e.

Vêca wek hûn dibînin, naveroka vê sitrana bavê min jî li ser şîretkarî û mêraniya “Mûsa Melek” camêran e . Ez dizanim, wekî dinê jî hîna gelek stranên bavê min yên weke: *Şêx Mîrzayê şêxê Anqosiya, Evdilê Qaz, Şerê Zêwîka Xaço, Delana Başo, Reşît Paşa û Xezalê, Binevşa Narîn û Cembelî*

*Mîrê Hekariya, Dawidê Dêwid û şerê çiyayê Şengalê, Asê û Hesen û hwd. hebûn û îro kêma kes hene ku karibin van stranên bavê min jî bisitrên.*

### **Birayê Selîm, te qet bi xwe stran, kilam anjî helbest afirandine û tû karî nûmuneyekê ji wan ji me ra pêşkêşbikî?**

**Selîmê Mecîd-** Vêga, kêfa min gelekî ji wan stranên kevn(kilasîk) re tê. Ez bixwe nikarim bisitirê, lê hinga ez hatime Almaniya û pêve, êdî min jî gelek helbest ji hiş û zanîna xwe afirandin. Ji xwe min got, zanîn û xwandina min ya bilind tûne. Lewma jî navaroka piraniya helbestên min li ser çande, rewş û êşên jiyana netew û civata me ya îro ne.

#### **Mînak :**

Ez di vê helbesta xwe ya bi navê “HEY XERÎBO, DE BÊJE!” de, dixwazim bêjime zane û xwandevanên me , de bêje û heta hûn ne bêjin, pirsgerêkên civata mezî çareser nabin.

### **HEY XERÎBO, DE BÊJE !**

*De bêje xerîbo de bêje  
Li rewşa min û xwe bêje  
Derdê min û xwe tev birêje*

*Hey xerîbo, de bêje  
Xweşiya welatê xerîbiyê li me rabû  
Berê min û te kete xerîbiyê  
Em tev ji welatê xwe dûr ketin  
Ez dikim û nakim xweşiya welatê xerîbiyê li min nayê  
Xerîbiyê axî û keser xistine dilê min  
Dilê min bû hêlîna birîndaran*

*Ez nikarim welat ji bîr bikim  
Dilê min herdem ji bo wî jan dide  
Çewa ji bîr bikim, emekê hezar salan  
Jî bîra min naçe nav û dengê mêrxasan,  
Dengê Şivan û şinge şinga satilên bêrîvanan*

*Hey xerîbo, de bêje  
Welatê rengîn ji destên me çûye, êdî na ye  
Piştî welatê zêrîn, ezê çibikim ji malê dina ye  
Hey xerîbo, ez bo te birîndarim  
Ji birînen xwe kûr dinalim  
Ji hesreta re bê derman im  
Jiyana xwe tevî didim te*

*Hey xerîbo, welatê pir şêrîn ne  
Ev çi zeman bû bi ser me de hat?  
Zemanekî gelek bar giran e  
Emrê me çû û me fahm nekir  
Me çî û meskenên xwe tev berdane  
Me fahm nekir, çi ma me tev berdane  
Me tev berdane, me tev berdane*

*Em li xerîbiyan warên biguman avadikin  
Çiqas li van waran diçim û tîm  
Ez qîz û lawan li dora xwe nabînim  
Li dora min tûne ne bîra û pismam  
Gelek digirim û dilêşan nabînim  
Nizanim kul û derdên xwe ji kê re bêjim?*

*Kul û kederên welatê rengîn ji dilê min dernayên  
Agirek di hînavê min de dikele  
Weke wê germiya welatê min e.  
Hey welato, ez ji bo te nebêjim,  
Ezê wekî dine ji bo çi bêjim  
Gava ez ji bo te nekim,  
Kî ye ji bo min bibêje?*

*Hey xerîbo, de bêje  
Ax xerîbî ne tu xemil e  
Ev rewş tevde bi kul birîn e  
Dil tîmî bi guman û bikeser e  
Xerîbî ji me re mal wêrane*

*Hey welato, şev û rojê li benda te me  
Xwezî egerek peydabive  
Bê li cem min ranebe*

*Her dem di nav destên min de be  
Belkî hingê dilê min şa bive  
Hey xerîbo, bê keso xerîbo bêje !*

Gelek helbestên min yê dinê jî hene û ev jî hêja di tu deverande ne hatine weşandin. Lê, min hinek ji wan di rojên cejn, îd û erefatên komala me de xwandin e.

### **Birayê Selim, li gorî dîtina Te, çima di nava Kurda de tenê kultur, sed û hedên Êzîdîyan bi Kurdî hatine û tene xwedî kirin ?**

**Selîmê Mecîd-** Bi dîtina min, meriv nikare kultur, sed û hedên Êzdîtî û Kurdîtiyê ji hevûdinê cûde bike. Yanî gava hinek kes û rêxistinên me Kurdîtî û Êzdiyatî ji hevûdinê dûr dikin û biken, ez hingê ji netewî û olprestiya wan jî biguman im.

Ezdahîti tev Kurdîti ye. Divê Kurdîti jî tev Êzdahîti be û ev herdû weke xwîn û goşt hevûdinê temamdikin. Xwedê ev bîr û baweriyên Ezdayatî-Kurdîtiyê dane me, heta hiş û taqeta me Êzdiyan hebe emê vê wisajî bêjin û biparêzin.

Ez dibêjim, heta ku em Kurd di siyaseta xwe de tenê netewê biparêzên û dîn anjî Êzdiyatîyê bidine paş, hingê demokrasiya li Kurdistanê jî rast nabe. Berevajê vê jî gava em kurdên Êzdî, Misilman û hwd. hebûn û parastina dîne xwe bixine pêşiya siyaseta netewa xwe, Kurdistan azad nabe.

Weke ku di erkên Êzdîtiyê yê herî sereke de de jî xwanê dibe û ez vêga jî ji xwe re dibêjim, divê em Êzdî û "kurdên resen" timî li parastina netew, ol, ziman, çanda, sed û hedên xwe re xwedî derkevin. Êzdîtiyê netewî ye û heta vêga rê-rêsmên Êzdiyan çande û netewa Kurdî parastine.

Ez baş bawerim, çî gava ku dewleteke Kurdî li goriya demoqrasi û azadiyê bê damezirandin û ew pêş bikeve, wê hingê Êzdîti jî baş pêş bikeve.....

### **Birê Selim, tû kengî derketî derveyî welat û gava tû hatî welatê Almaniya yê te pêwendiyên xwe çewa bi şoreşgerên Kurdî re danî?**

**Selîmê Mecîd-** Ez di 1977 de hatime Almaniya rojava(BRD). Min pêşîn pêwendiyên xwe bi hinek şoreşgerên Kurdên ku li virê dijîyan re danî. Dûre min û çend hevalên xwe di sala 1979 de Komela Karkerên Demokratên Kurdistan(K.K.D.K) li bajarê Celle damezirand.

Armanç û tekoşîna vê komela me KKDK, hînge li ser guherandînen pîrsgîrekên aborî, civakî û siyaseta netewa Kurdî bû. Me bi vê xebata gelekî zahmet, dixwast hasten netewî û şoreşgerî di nava civaka me Kurdên li Almaniya yê bilintir bive. Her weha me dixwast hêza komelên karkerên demokratên şoreşgerên Kurd û hebûna Kurdan di nav qada navnetewî, çep û şoreşgerên cihanê û bi taybetî jî dinava civaka ku em bi wan ra dijîyan de bidine xwanê. Ji bo mafê RADIO u TV`ê Kurdî li Almaniya yê bêne naskirin(sibata 1980) me jî komel, sazî, partî û sendîqên Alman û xerîban piştgirî xwast.....

Ji bona em bigihîjine van armançên xwe, ez hingê di gelek çalakî, civîn, semîner, şev, meş û piştgiriyan giranbuha de beşdar bûm.

Binêrên li vî wêne :2 yê min û hevalên min. Me hêja hingê digot: "her tişt jî bo siyaseta demoqraten şoreşgerên Kurdistan"\*1. Em endamên KKDK Celle, bi qefle qefle tevî jin û zarokên xwe sê hefta li ser hevûdinê, di bin germa tîrmehê de, di çûne êşêf/xepara şeker pençarê û perê me hingê qazanckirî(5730 DM) dane pêdiviyên KKDK. Celle.

Min bi hezaran belavok li ser rewş û pîrsgîrekên netewa Kurdî bi zimanê Kurdî, tirkî û almanî di nava gel de belakirin.

Min û hevalên endamên Komela Karkerên Demokrat, di 23.09.1979 de cara yekemîn li nava bajarê Celle de ji bo piştgiriya çanda Kurdî, xurtbûna şoreşger û demokratên Kurd şeveke bi rêk û pêk amadekir. Delîl û şade kesên hîna li Celle dijî û aghdariyên di kovara ARMANC hêjmar 7 çiriya pêşîn 1979 rûpel:7 de ne.

### **Binêren li wêne:3 û 4**

Gava cunta faşîst a leşkerî di 20-21.09.1980 de li Tirkiyê destdanî ser desthilatdariyê, hingê min û hevalên xwe gelek çalakî û xwepêşand li dijî zilm û zordestiya wê kirin.

Nimûne: Derfeta we hebe, binêrin li Kovara ARMANC hêjmar 17 Cotmeh 1980 ê û gelekên di peyre hatine weşandin

### **Binêren li wêne:5**

Ew folklorê ku min û hinek hevalên xwe ji bo parastin û nasandina reqs û govendên Kurdî, ji deng, reng, cil û bergên Kurdî û bi ruhekî Kurdewarî damezirandibû diçû li gelek bajêran tevî çalakî, şev û festivalên çandî yên ku di nava Almaniya yê de ji bo gelê Alman û civakên xerîban çanada hevûdinê nasbikin û bipejirîn dibû.

Bê guman gelek delîlên vê xebata me hene û ev wêne folklorê me di rojnama Oldenburg NWZ `ê 15.06.1988 de tevî aghdraya piştgirîya me ya di şeva 13.06.88 de ku şaredariya bajarê Oldenburgê ji bo nasandina çanada biyaniyan amadekiribû de hatiye weşandin.

Dîsa min û hinek hevalan grûpa topê ya ku vêga hêjî bi navê DÎCLE heye di sala 1984 de damezirand. Gelek kes dizanin ku min jî şeş salan di vî taximî de leyîstiyê û gelekî zahmet di nav rêveberiya vê gurubê de dît. Ez zahf dilxweşim ku ev taximê topê hêjî weke taximê Kurdan di nav gruben li Celle hene dileyizin.

Gava rojnama ARMANC `ê di gulana 1979 de derket û heta ku 06.1997 de xatir ji me xwast, ewê bi zimanê Kurdî û Tirkî weşan dikir û min jî bi dilekî xweş bi kes û gel ra dixwand û beladikir.

### **Binêren li wêne: 6**

Ji xeynî van çend nimûnan ji naxwazim êdî zêde bahsa xebata xwe ya di nava vê komela şoreşger û demokratên Kurd de bikim.

Hemû kurdên ku li bajarê Celle dimînin, heval û pismamên min jî dizanin ku min û hevalên xwe yên di nav xebata Komela Karkerên Demokrat Kurdistanê(K.K.D.K) ya li bajarê Celle de tu carî bêhemdîtî bi wan û zarokên wan re nekirine û heta ji me hatiye me ne hîştîye dilê wan ji me bimîne. Me xizmeteke welatperwer û gelemperî dimeşand. Lê, hinek kesên ku siyaseteke gundane û radîkal difikirîn, ji vê xebata min û hevalên min ne razî bûn. Ji ber vê ewan ez û hevaleyê min bi kêran birindar kirin. Lê, tştê ji me hat me nehişt ku dûbendîtiya gundîtiyê di nav civaka me de berdewam bike.

Vê paşê wexta xebata Komela Karkerên Demokrat Kurdistan(K.K.D.K) ya li bajarê Celle di sala 1985 de hate rawestandî û pêve, êdî min di nav mal û malbatên me de xebata xwe dîsa berdewam kir.

Gava gelek kes û nasan di gengeşên me de dîtî ku em Êzdî hêjî ola xwe baş nasnakî, ew tifaqa ku di nav mal û malbatên me de hebû jî dipelişin, gelek nakokî di nav vê civak û jiyana me ya nû de derdikevin, pirsgirêkên me û zarokên me gelekî mezin dibin, çanda bav-kalên me wenda dibe û hwd. Di pey van dahîn û standinan re min û çend nas û hevalan xwast di sala 1990 de bi hevûdinê re ji van nakokî û pirsgirêkên di nav civaka me de hene re xwedî derkevin. Vêca me li hevûdinê kir ku em komeleke bi navê "Kultur Centrum- Navenda parastina ol û çandê" ji bo parastin û pêşvebirana ol û çanda xwe bidamezirînin. Ji xwe hingê ev fikra damezirandina komelên ji bo parastin û pêşxistina Êzdiyatîyê ji xeynî ya nav bajarê Celle yê li wan bajarên ku Êzdî lê diman jî kêmbûn.

Min sê salan di rêvebirya vê komela "Kultur Centrum- Navenda parastina ol û çandê" de jî xebat kir. Me di nava van sê salan de çend komên parastina olê û hevkarîyê jî damezirandin.

Wextê min di nav xebata vê komelê de jî dît ku hinek kes nikarin xwe ji jiyana gundatiyê, perwerdaya feodalî û berjiwendiyên şexsî dîr bikin, hinek jî dixwazin tenê di warê siyasî de xebatê bikin û em nikarin li ser wan armancên komela "Kultur Centrum- Navenda parastina ol û çandê" xwe de pêş bikevin û derfetên ku ez bi wan re jî kar bikim neman, êdî min rabû xebat û endametiya xwe ya di komela "Kultur Centrum- Navenda parastina ol û çandê" de rawestand.

Lê, gava ez ji wan veqetiyam û pêve jî, min dîsa xebata xwe li goriya îmkân û derfetên xwe di nav civakê de kêmbûn nekir. Wek min gotî, ji xwe xebata min timî jî bo parastin û pêşxistina çande, urf û adetên civakê û ne bi siyasî bûn. Li goriya baweriya min divê em xwe ne tenê bi gotinan biparêzen û di kiryarên xwe de bi haweyekî dinê bixebitin. Gava em ne bi fikir, reman û ji bo berjiwendiyên civaka xwe bixebitin, emê nikarîbin ji van êş û belayên xwe re jî çareseriyekê bivînin.

Dûre min dît hinek heval û xuşkên ku mîna min difikirin hene. Me xwast mîna xebata Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldenburg ê ji van nakokî û pirsgirêkên di nav endmên civaka me de hene re xwedî derkevin. Me di sala 2002 de komeleke bi navê "PÊC- Platforma Êzîdiyên Celle"yê damezirand.

Armancên vê komela "Platforma Êzdiyên Celle"yê di destûrnama wê de binêrin li <http://www.yeziden-celle.de/index.php?id=20> hatine birêzkirin û ez naxwazim zêde bahsa wan bikim. Me di nava van şeş salen derbasbuyî de gelek xebat kiriye. Kesekî ku bi xwaze bizanibe ka me bi navê PÊC çi kiriye û em çi dixwazin ji bo pêşeroja Êzdiyatîyê bikin, bila keremke bi me re pêwendî deynen, anjî li malpera me binêrin.

*Birê Selîm, weke ez dizanim, mal û komelên Êzîdiyan yên li Ewropa û bitaybetî jî yên ku li Almaniya yê hene, xwastin bihevûdinê re yekîtiyeke tevgera Êzîdiyan bidamezirînin û gelek modelên cûda (weke Yekitiya Êzîdiyanê Kurdîstanê, Yekitiya Rewşenbîrên Êzîdiyan, hevkarîya mal û komelên Êzîdiyan, Navenda Êzîdiyan li Niedersachsen, Civaka Êzîdî-Ewrupeyî û hwd.) jî ceribandî û bi ser neketin.*

**Bi dîtina te, Sedemên ku Êzîdî nikarin weke civatên dinê bi hev re tevgerê li gorî pêşketin û teknolojiya demê bidamezirînin çine?**

**Selîmê Mecîd-** Belê, ji xwe li ser vî babetî gelekî civîn çêbûn, dûre pir hatiye gotin û nivîsandin. Lê, bi dîtina min divê meriv baş bizanibe; ka meriv ji kurê hatiye, li kurê ye û wê bi kurve here?

Li gor dîtina min, gelek ji rêvebir û berpirsyarên Mal û Komelên Êzîdiyan bi dilpakî doza Êzdiyatîyê dimeşînin, lê bi fikir û reman xwe hêjî ji jiyana gundiya xwe xelaz nekirine. Lewma hinek jê vêga hêjî birêvebirina rêxistinên xwe fahm naken, daxwaza wan ewe ku ew timî di rojevê de hebin. Hinek jî dîroka berxwedan û tekoşinên Êzîdiyan li goriya berjvendiya siyasî û şexsî tînine ziman. Ji xwe pêşiyên me ne beredayî gotine, "zahfîn, lê bê mahfîn". Her çiqas hêjmara mal û komelên me pirbin jî, hêja xwandevan û ciwanên Êzîdiyan di nav wan zahf kêmin. Zane û endamên civaka me ji daxwaza demê re gelekî qelsin û em hîna nikarin li gorî pêşketin û teknolojiya demê bersiva Êzdiyatîyê û netewa xwe bidin.

Ez hêvîdarim rewşenbîr, lêkolîner û nivîskarên mîna te kekê Kemal Tolan zêde bivîn û li virê dixwazim dîsa te pîroz bikim, ku te pirtûkeke pir hêja ji bo dewlemendiya arşîva çanda Êzdiyatîyê berhev kiriye.

*Başê birê Selîm, te ji tecrûbên xwe baş zelalkir ku çima hinek endamên civata ruhanî, merivên oldar, rewşenbîr, berpirsyarên mal û komelên Êzîdiyan rexnan qebûl nakin.*

**Gelo meriv çawa dikare pêwendî û yekîtiya di navbêna civaka Êzîdiyan li hemû perçên Kurdistanê, Sovyeta berê û Ewropayê bihêtir xurt bike?**

**Selîmê Mecîd-** Bi dîtina min, ji bo xurt bûna pêwendî û tifaqê divê em gelek qedir bidine tiştên wek cejn, tiwaf, duha, rojî, dana qûrbanê û hwd. yên pîroz. Her kes, rêber û zanên me hevûdinê tehamûl bikin û hurmetê bidîne fikrên cûde. Em tev netewî perest bin. Ji xwe heta zanîn û tehamûlkirina me xurt nebe, em di jiyana xwe de - ji gotin û kiryarên xwe re xwedî dernekevin, pêwendî û tifaqa me jî xurt nabe. Gava em îro diriya civak û netew xwe de nebin yek û hevûdinê tehamul nekin, wê sibê ziman û çanda zarokên me jî zû bihelin. Ji bo vê jî divê her kes ji me destên xwe deyne ser dilê xwe û ji wîjdanê xwe bipirse.

**Selîmê bira, li gor nêrîna te, wê pêşeroja Êzîdiyan li xerîbiyê çawa be?**

**Selîmê Mecîd-** Wekî ku min niha got, ez di vê helbesta xwe "Em Êzîdî ne" de jî didime xwanê, gava em Êzîdî xwe bi demê re negihînin, demê li goriya xwastina xwe me biguhêze. Lewmajî pêşiyên me gotine, "dem bi demê re, her dem bi Xwedê re"

## EM ÊZDÎ NE

Em Êzîdî ne, Êzîdî ne  
Li ser navê Êzî ne,  
Bi ola xwe em Ezdahî ne  
Em bi nijada xwe Kurdî ne  
Timî ji ol û erkanê xwe razî ne

Em Êzîdî ne, Êzîdî ne  
Ji deşt û çiya hatin e  
Em vêga bajarî ne  
Lê, bi fikrê em hê gundî ne

De werin em xebat bikin  
Xwe bi demê re bigînin

Em tev birîndarin,  
Ji birînen xwe kur dinalin,  
Ji hesretan re bê dermanin,  
Ji hebûnê re bê gumanin  
Di mala xwe de tev birîndarin

De xebat bikin bi dil û can  
Em ji hevûdinê re nefis piçûk bin  
Em bihevûdinê re ser bilind bin  
Tev de jiyane li hev pîroz kin

Em xerîbên bê welatin  
Ji dert û kulan re dinalin  
Heywax Êzdîno em dil jarin  
Em ji xwe re kehr û lalin  
Ji xelqê re şalûl û bilbilê şiyarin  
Lewmajî herdem jar û perîşanin

De werin em bihevre bikin qîr û hawar  
Em ne şervan, lê gelekî aşîti xwazbin  
Em ne pîrbêj, lê ji xwe re zanebin  
Derd û kulên me jihevûdinê cûde nekin  
Şiyarbin, binêrin li dem û dewranan  
Bizanin ka em ji kurê hatin û bi kurve herin?

Em Êzdî ne, Êzdî ne,  
Cil sipî û cenetî ne  
De bese lo, de bese,  
Êzdîti nasîn ne, wê nas bike  
Ew kum û kolosê ku serî germ neke, ew ne yê ser girêdan nê ye  
Ew çiyayê ku xezal tê de neçêrin, ew ne çiyayê koçeriyê ne

Dengê keserên dayîkan tê ye min  
Dayîk dikin qîrîn û hawar  
Dibêjin, qîz û lawên min terka min dan  
Haware ji bo Xwedê, hawar e!  
Perçeyekî ji bedena min çêbuyî, ez birîndar kirim

Dê û bav ketine şîneke giran  
Dibêjin, dinya li sere me xirabû  
Gelî xûşk birayên hêja  
Keserên dayîkan min birîndar dikin  
Ez nikarim bê deng bimînim

Qîz û lawên me diçin  
Dine me ji destan diçe  
Welatê me ji distînin  
Em ji rêya Xwedayê xwe qut dibin  
Em çima bêdeng dimînin?

Ez ji bo zarok û xwandevanên me ji weke ku xuşka min Gulê gotî dibêjim, “gava hûn sibê di derheqê ola xwe de tişteki nizanîbin, li ser netew û kultura xwe ne zane û agehdar bin û xelq ji we bi pirse, bêje hûn kî û çi ne? Gelo hûnê hingê ji şexsiyeta xwe şerm nekin?”

**Selîmê bira, gelek sipas ji bo berxwedan, nêrin û hestên te. Hêvîdarim ji Xwedê, ku tû di saxî û armancên xwe de her serkevtî bî.**

**Selîmê Mecîd-** Ez jî dibêjim gelek spas ji bo vê xebata te birê Kemal, tû jî birastî pir serê xwe di ber Kurdewarî û nasandina Êzdiyatîyê de diêşîni. Xwedê bike tû gelekî sax û her serfiraz bî!



21.07.08